

FAQ Coronaschutzverordnung - gültig bis vorerst 30. September

Danxuyandina Çapemenîyê – 765/09/2020

Duseldorf, 15ê îlona 2020î

Bakurê Ren-Vestfalyayê Fermana Qanûnî ya Koronayê fireh dike: Destûra tevlihbûyîna temaşegerên bêtir a li çalakîyên sîporê hat dayîn

Ji bo sîporên amator û navdar ên Bakurê Ren-Vestfalyayê/eyaletên wê zengên eşkere / Eyalet, li ser qaydeyên ji bo temaşegerên karibin di çalakîyên tîmên sîporê de li seranserê welatî cîh bigirin, li hev kirin

Hikûmeta eyaletê vê dide zanîn:

15ê îlona 2020î roja sêşemê kabîneya eyaleta biryar da ku biryarên koronayê heta 30ê îlona 2020î bên dirêjkin. Guherînen hîmî di warê sîporê de ne: Li vê derê, li avahîyên hemû cîhên sîporê carekê din destûra temaşegerên bêtir tê dayîn. Tevlî vê, gava zehmetîyên taybet ên pêşbazîyên tîman dikişinin ên bala alîgiran dikişinin, eyaletên federal, di çalakîyên tîmên millî de û herweha maçên Bûndeslîgayê de li ser pirsê temaşegeran li ser rawestîneke hevpar li hev kirine. Di serî de di çarçoveya tecrîbeyeke ku şeş hefte dewam bikin de, eger qaydeyên hişk ên parastina ji enfeksiyonê û hîjyenê pêk bên, dê bi temaşegerên li seransarê welêt in re çalakîyên sîporên tîman dîsa karibin bên kirin.

Serekwezîrê eyaletê Armîn Laschet: “Me soz da ku em ê li ser qaydeyên çarçoveya bi hezaran klabên sîporê biryareke zelal bidin. Çalakîyên sîporê bi desteka alîgiran di rewşa temaşegerî de bi pêş ve diçe. Ev ji bo maçên Bûndeslîgayê û sîporên amator û navdar jî di rewacê de ye. Ji ber vî awayî me dest pê kir em bi sîporên amator re didin û distînin û di vê çarçoveyê de ji bo çalakîyên herêmî yê li seranserê welêt tîn zanîn, ji bo em çareyeke zû û bi tevahî bibînin em li serê hûr bûn. Em vêga van her du hêmanan di qanûnên guncayî de pêk tînin û bi saya vî awayî em ber bi asabûneke bi berpirsiyarî gaveke din jî diavêjin. Bi konseptên ewle yê parastina ji enfeksiyonê û sînorkirinên kapasîteyê, klab, êdî dikarin avahîyên sîporê zindî bikin. Ev pêşîk in: “Konseptên paqijîyê, rêlibergirtinên parêzkar û lêhûrbûneke bi hişyarî.”

Wezîrê Sîhetê Karl-Josef Laumann: “Sîpor, di mehên paşîn de bi darê zorê hat testkirin. Her kes dizane ku sîpor bi temaşegeran û rewşa stadyûman zindî dibe. Gelek kes bêriya vê rewşê kirine. Lê di heman astê de tiştê eşkere jî ev e: Parastina li dijî enfeksiyonê û herweha parastina sihhetê divê tiştê herî pêşîk be. Ji ber vî awayî em gelek hay jê hene ku kesên sînorkirî bên qebûlkin. Lê ev bi tenê eger mirov hay ji asta enfeksiyona herêmî hebe û paqijîya taybet û rêlibergirtinên parastina enfeksiyonê pêk bên mumkin dibe. Ev ê teqez ji bo her kesî piroseyeke dijwar be. Me heta vêga bi zehmetîyan pir baş karibû. Eger her temaşeger qaydeyên taybet ên cîhê lê ye hişkehişk û bi berpirsiyarî pêk bîne ez bawer im ew ê di vê rewşê de jî bi ser bikeve.”

Ji bo çalakîyên sîporê qaydeyên nû

Ji 16ê îlona 2020î pê de bi şertê ku konseptên parastina taybet a ji enfeksiyonê bê pêşkêşkin, dê dîsa bêtirî 300 temageran dîsa karibin di çalakîyên sîporê de yan di pêşbazîyan de cîh bigirin. Ji bo bêtirî 1000 temaşegeran -her wekî çalakîyên din-dê

sînoreke jorîn a sêyeka kapasîteya avahîya sîporê pêk bê. Di sîporên bêyî bihevvebûnê de bihevexistina li ser jimara tevlibûyîyan bi lehê sîporên xwedanên mezinahîyên îstîsnaî de hat firehkirin, dê bi vî awayî hemû leyîstikvanên ji sîpora xuyandî re bivên – her çend ji jimara herî pir a 30î bibuhurin jî dê êdî karibin tevli leyîstikê bibin. Dê hikûmeta eyaleta di vê çarçoveyê de biryarên hefteya çûyî yên di zîrweya hevpar a bi nûnerên klabên sîporê û komeleyan re sitandî êdî pêk bîne. Ji bo çalakîyên sîporên tîmên li seranserê welatî di çarçoveya pêkanîna tecrîbekirinê de bihevexistinên taybet di rewacê de ne.

Eyalet li ser çalakîyên sîporên tîman ên li seranserê welêt li hev kirin

Eyaletên federal îro di çarçoveya erêkirina temaşegeran a ji pêşbazîyên sîporên din înan tîman ên li seranserê welêt û maçên Bûndesligayê de li ser mijarên xalên kilîlk ên jêrîn li hev kirine:

- Di xebateke şeşhefteyî ya tecrîbekirinê de, dê konseptên paqijîyê yên erêkirina temaşegeran a ji çalakîyên sîporê yên seranserê welêt bîn testkirin.
- Dê hay ji şofa heyî bê heyîn. Li cîhî serê 100.000 kesî însîdansa 7 rojan 35 yan bêtir be û asta enfeksiyonê bi awayekî eşkere nikaribe bê sînorkirin dê temaşeger ji çalakîyan re neyên qebûlkin.
- Dê pêdivêya navbera 1,5 mîtroyî bi kêmkirina jimara temaşegerên herî pir, di ketin û derketinê de wekhevkirina çûn û hatina serdêran û qedexekirina xizmeta araqê û vexwarina wê bê dabînkirin.
- Heta rûniştinê û rabûna ser pêyan, dê lixwekirina parêzkara dev û difnî mecbûrî be. Dê têr hewadarkirina cîhên çalakîyê bê pêkanîn.
- Dê jimara temaşegerên destûrdayî ji bo her cîhekî cuda cuda bê xuyandin. Di seranserê gava xebata tecrîbekirina şeşhefteyî de kapasîteya herî pir a destûrdayî li def bêtîrê 1000 temaşegeran ji sedî 20ê kapasîteya stadyuma yan eywana xuyandî be.

Dê hemû guherînen di fermanên qanûnî yên eyaleta Bakurê Ren-Vestfalyayê de 16ê îlona 2020î roja çarşemê bikevin rewacê.

Fermanên Qanûnî yên tîkildar dê di nava rojê de li vê navnîşanê bîn weşandin:
www.land.nrw

Ev xuyandîna çapemenîyê ji bilî van, herweha di înternetê de di vê navnîşana hikûmeta eyaletê ya înternetê de jî heye: www.land.nrw

[Xuyandîna parastîna daneyan a li ser çapemenîya civatî](#)